# WÊNESAZÎ

## SERETAYÎ 5

## AMADEKAR

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Wênesaziyê ve hatiye amadekirin.**

## LÊVEGER

**- Komîteya Şopandinê**

**- Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK

WÊNESAZÎ........................................................................................7
RENGÊN GERM Û YÊN SAR .......................................................8
RENGÊN DARÎ Û YÊN MÛMÎ .....................................................11
RENGÊN AVÎ ...............................................................................14
NEXŞ...........................................................................................17
TAWIS .........................................................................................20
GEMIYA HÊLEKANî ......................................................................23
PAPA NIWÊL ...............................................................................26
NÎGARKIRINA BI RÊYA TEŞEYÊN DEST ........................................29
SEYRANA DIBISTANÊ ...................................................................31
PAQIJIYA JÎNGEHÊ.......................................................................33
KARÊ DESTAN ............................................................................35
AFIRANDINA TEŞEYAN JI PELÊN DARAN......................................36
FÛSEYFÛSA (MOSAIC) .................................................................38
GULDANKEKE JI KARTONÊ...........................................................41
GULÊN JI KARTONA HÊKAN .........................................................46
RÊBAZA KELEMKELEMÎ.................................................................53
DAPÎR Û BAPÎR.............................................................................57
NÎGARKIRIN Û TEWANDINA PELAN..............................................61
KAREKÎ JI DARIKÊN GUHAN .........................................................66
ÇAPER...........................................................................................70
MIJAREKE SERBEST ......................................................................74

# BEŞA YEKEM

# WÊNESAZÎ

## Armanca Beşê:

- Fêrkirina xwendekar, çawaniya bikaranîn aşopa xwe.
- Fêrbûna cudahiya pileyên rengan û sazkirina teşeyên nû.


1. **RENGÊN GERM Û YÊN SAR**
2. **RENGÊN DARÎ Û YÊN MÛMÎ**
3. **RENGÊN AVÎ**
4. **NEXŞ**
5. **TAWIS**
6. **GEMIYA HÊLEKANÎ**
7. **NÎGARKIRINA BI RÊYA TEŞEYÊN DEST**
8. **PAPA NIWÊL**
9. **SEYRANA DIBISTANÊ**
10. **PAQIJIYA JÎNGEHÊ**

WANE 1

# RENGÊN GERM Û YÊN SAR

## Rengên Germ:

Ji ber ku rengê sor, zer û pirteqalî di bingehê xwe de rengên ronahiyê ne û ronahî hestekî germ dide me, navê rengên germ li wan tê kirin. Her wiha ev reng nêzîkbûnê ji me re nîşan didin.



## Hin Mînakên Rengên Germ ji Xwezayê:







Ev wêneyên li jor hestekî germ an sar didin te?

## Rengên Sar:

Ji ber ku rengê binefşî, kesk û şîn serma û dûrbûnê ji me re didin xuyakirin, navê rengên sar li wan tê kirin. Mînak: dar, derya û çiyayên dûr.



## Ji Xwezayê Hin Mînakên Rengên Sar:







Ev wêneyên li jor hestekî germ an sar didin te?



## RAHÊNAN:

1. **Pirsên li jêr bibersivîne:**
   - Rengên sar û yên germ di vê tabloyê de nîşan bike.
   - Rengê şîn ê çiyayan, dûrbûn an nêzîkbûnê ji te re diyar dikin?
2. **Wênsaza/ê behremend, nîgarekê li ser lênûsa wênesaziyê nîgar bike û tê de rengên germ û yên sar bi kar bîne.**

**WANE 2**

# RENGÊN DARÎ Û YÊN MÛMÎ

## Rengên Darî:

Di teşeyên pênûsên zuha de ne. Dema ku ev reng ji aliyê kesên destpêker ve tên bikaranîn, bikaranîna van rengan pir hêsan e. Her wiha di piraniya caran de, di xêzkirina tabloyên biçûk de tên bikaranîn. Ev cureyê rengan li ser pel û kartonên rengîn û bi taybet kartonên hişk tên bikaranîn.





Ev nîgar bi rengên darî hatiye rengkirin.

## Rengên Mûmî:

Di teşeya pênûsan de ne. Ev reng di tevdana rengan de encameke pir xweşik didin û piraniya caran di tabloyên biçûk de tên bikaranîn. Her wiha li ser karton û pelên rengîn jî tên bikaranîn.



Ev wêne bi rengên mûmî hatiye xêzkirin.



## RAHÊNAN:

1. **Pirsên li jêr bibersivîne:**
   - Taybetiya rengên darî çi ye û ji aliyê kê ve tên bikaranîn?
   - Rengên mûmî li ser çi tên bikaranîn?
2. **Nîgarkêşê/a jîr‹ piştî ku me rengên darî û yên mûmî nas kirin, ka em niha li ser lênûsa wênesaziyê nîgarekê bi rengên darî yan jî bi yên mûmî nîgar bikin.**

**WANE 3**

# RENGÊN AVÎ

## Rengên Avî:

Ev reng wek ku ji navê wan xuya dibe, av li wan zêde dibe. Heger em bixwazin reng zelal bikin, em qaseya avê zêde dikin da ku reng zelal bibe; berevajî wê dema em bixwazin reng tarî bikin, em qaseya avê kêm dikin. Rengên avî li ser pel, caw û depê tên bikaranîn.



## Amûrên Pêwîst ji Bo Bikaranîna Rengên Avî:

Av, kaxez, firçe û tabloya lihevxistina rengan.

**Av:** Hêmana herî giring ji vî cureyê rengan re ye û divê av paqij be.

**Kaxez:** Divê kaxez baş fişarbûyî (sitûr) be û avê nekişîne, ji bo ku kaxez nenepixe û ji hev nebe.

**Firçe:** Qebareyên firçeyan cuda ne, bi jimara ku li ser wan hatiye nivîsîn, diyar dibin. Ji bo kîtekîtên biçûk, firçeya biçûk tê bikaranîn û ji bo rûberên fireh firçeya mezin tê bikaranîn. Piştî bidawîkirina bikaranîna rengekî, em ji bîr nekin ku firçeya xwe baş bişon, ji bo ku rengê nû gemar nebe.



Ev her du nîgar bi rengên avî hatine xêzkirin.

## RAHÊNAN:

1. **Pirsên li jêr bibersivîne:**
    - Em çawa dikarin rengên avî zelal û tarî bikin?
    - Amûrên rengên avî yên pêwîst çi ne?

2. **Wênesaza/ê zîrek, nêgarekê bi rengên avî li ser lênûsa wênesaziyê yan jî li ser kartonekê nîgar bike.**

**WANE 4**

# NEXŞ

Nexş, ji komek xêz, xal, teşeyên geometrî yan jî ji hin teşeyên lawir, şînatî û nivîsan, pêk tê. Di encamê de teşeyeke birêkûpêk û hevseng saz dibe.

## Bikaranînên Nexşan:

Nexş ji bo xemilandina avahî, dêr, mizgeft û hwd tên bikaranîn.



## Cureyên Nexşan:

**Nexşa Nivîskî:**




**Nexşa Şînatiyî:**



**Nexşa Lawirî**



**Nexşa Geometriyî**



## RAHÊNAN:

1. **Pirsên li jêr bibersivîne:**
   - Çend cureyên nexşan hene?
   - Nexş ji bo çi tên bikaranîn?


2. **Nîgarkêşê/a zîrek, cureyek ji cureyên nexşan li ser lênûsa wênesaziyê nîgar bike û bi rengên guncaw rengîn bike.**

**WANE 5**


## TAWIS

Tawis, ji nav malbata firindeyan, firindeyê herî xwşik e. Ew xweşikbûn jî vedigere perîkên wî yên rengîn.





# Gavên Nîgarkirina Tawis:



## RAHÊNAN:

1. **Pirsa li jêr bibersivîne:**
   - Çima tawis ji firindeyên herî xweşik tê dîtin?

2. **Wênesaza/ê pêşerojê, ka em li gor gavên ku em di vê waneyê de fêrbûne, tawisekî li ser lênûsa wênesaziyê nîgar bikin û em hewil bidin bi rengên sar û yên germ rengîn bikin. Pêwîst e em guh bidin paqijiya lênûsa xwe, da ku em nîgara xwe di pêşangeha dibistanê de, pêşkêş bikin.**


**WANE 6**

## GEMIYA HÊLEKANÎ

Gemiya hêlekanî, bi alîkariya hêza ba, li ser avê dilive û bi rê ve diçe.



## Gavên Xêzkirina Gemiya Hêlekanî:



## RAHÊNAN:

- **Wênesazê/a jêhatî, li ser lênûsa wênesaziyê li gor gavên ku em di vê waneyê de hîn bûne, gemiyeke hêlekanî, bi rengê ku tu jê hez dikî, nîgar bike. Ji bîr neke ku berê tevgera pênûsa rengîn di heman aliyî de be û hevseng be. Her wiha guh bide paqijiya lênûsa xwe.**

**WANE 7**

## PAPA NIWÊL

Papa Niwêl, kesayeteke girêdayî sersala xiristiyaniyan e. Taybetiya vê kesayetê di cil û bergên wî yên sor û riya wê ya spî de ye. Her wiha bi rûkeniya xwe jî tê nasîn.



## Gavên Nîgarkirina Papa Niwêl:



10



11



12




## RAHÊNAN:


- **Destnîgarê/a jîr, ka em li ser lênûsa wênesaziyê li gorî gavên ku di vê waneyê de bi me re borîn, Papa Niwêlekî nîgar bikin û bi rengên darî rengîn bikin. Her wiha pêwîst e em paqijiya lênûsa xwe ji bîr nekin.**

**WANE 8**


## NÎGARKIRIN BI RÊYA TEŞEYÊN DEST

Wênesazî, hunerek e derfetê dide ku tu karibî her tiştî bi giyan bikî. Weke çawa em ê di vê waneyê de, bi alîkariya teşeyê dest, teşeyên cuda saz û nîgar bikin.





## Gavên Xêzkirina Serê Qazê Bi Rêya Teşeya Dest:





## RAHÊNAN

- Wênesaza/ê zîrek, bi alîkariya aşopa xwe, nîgarekê nêzî vê nîgara ku me ew bi gavan daye xuyakirin, biafirîne û paşê bi rengên mûmî rengîn bike.

**WANE 9**

## SEYRANA DIBISTANÊ

Di rêya seyrana dibistanê re, xwendekar fêrî xebatên komînal û hin çalakiyên werzişî dibin. Dibe ku seyrana dibistanê li cihekî dîrokî, şûnwarî yan jî li cihekî geştyarî be.








## RAHÊNAN:

- **Wênesazê/a jîr, dîmenekî di aşopa xwe de saz bike ku tê de, tu bi hevalên xwe yên dibistanê re, ji bo seyranê diçî cihekî geştyarî. Paşê wê dîmena ku te di aşopa xwe de xêz kiriye, bîne û li ser lênûsa xwe ya wênesaziyê nîgar û rengîn bike.**

**WANE 10**

# PAQIJIYA JÎNGEHÊ

Jîngeh mala me ya bêsînor e. Em pêdiviyên xwe yên rojane; çi av, xwarin an jî bayê paqij be, jê bi dest dixin. Lewma pêwîst e em guh bidin jîngeha xwe; gemarê neavêjin erdê û nava avê. Ev dihêle ku em xwe ji nexweşiyan biparêzin û ziyanê negihînin tendirustiya xwe û jîngehê.



Di vê nîgarê de, wêneyê jîngeha paqij ji me re xuya dibe.



## RAHÊNAN:

- **Wênesaza/ê jîr, dîmenekî paqijiya jîngehê bi rêya nîgarekê, li ser lênûsa wênesaziyê nîgar û rengîn bike. Pêşî hêmanên ku tu dixwazî xêz bikî di aşopa xwe de hilbijêre û paşê bi pênûsa risas bi xêzên sivik li ser lênûsa wênesaziyê xêz bike. Di dawiyê de bi rengên darî bi awayekî hevseng rengîn bike.**

# BEŞA DUYEM

# KARÊ DESTAN

## Armanca Beşê:

1. Fêrkirina xwendekar, qezenckirina çi tiştên derdorê ango ji heyberên cuda afirandina teşeyên nû.
2. Bi vî awayî aşopa xwendekar fireh dibe û dikare her tiştên derdora xwe; çi pelên daran bin, karton yan jî pelên normal bin, bike teşeyên nû.
3. Xwendekar, êdî dikare di karê xwe de, cawbir bi awayekî baş bi kar bîne.

1. **AFIRANDINA TEŞEYAN JI PELÊN DARAN**
2. **FÛSEYFÛSA**
3. **GULDANKEKE JI KARTONÊ**
4. **GULÊN JI KARTONA HÊKAN**
5. **RÊBAZA KELEMKELEMÎ**
6. **DAPÎR Û BAPÎR**
7. **NÎGARKIRIN Û TEWANDINA PELAN**
8. **KAREKÎ JI DARIKÊN GUHAN**
9. **ÇAPER**
10. **MIJAREKE SERBEST**

**WANE 1**

## AFIRANDINA TEŞEYAN JI PELÊN DARAN

Em dikarin teşeyên cur bi cur ji pelên daran biafirînin û tabloyan ji wan saz bikin; çi yên hişk bin an jî şîn bin. Em ê di vê waneyê de fêrî hin teşeyan bibin.



**Amûrên Pêwîst:** hin pelên daran, pênûseke risas û şîrêz.

**Çawaniya Çêkirina Karekî ji Pelên Daran:**

1. Di gava yekem de, em ê pelên daran bi alîkariya şîrêzê bi kaxeza wênesaziyê ve vekin.
2. Di gava duyem de, em ê gewdeyê teşeya ku em dixwazin, bi pênûsa risas xêz bikin. Bi vî awayî em tabloyekê ji pelên daran bi dest dixin.



## RAHÊNAN:

- **Wênesazê/a jêhatî, teşeyeke ku tu jê hez dikî bi rêya pelên daran saz bike, da ku tu refa xwe pê bixemilînî û di pêşangeha dibistanê de pêşkêş bikî.**

**WANE 2**

## FÛSEYFÛSA (MOSAIC)

Fûseyfûsa, ji kevintirîn hunerên wênesaziyê ye. Tabloya wê ji gelek parçeyên rengîn ku bi awayekî hevseng bi cih dibin, pêk tê. Piraniya wan parçeyan ji sîramîk, mermer, cam û kaxezan pêk tên.



**Amûrên Pêwîst:** peleke kesk, peleke pembehî, peleke qehweyî û cawbir.



## Gavên Çêkirina Darekê bi Fûseyfûsayê:

1. Em ê ji pelên bi rengê kesk û yê qehweyî parçeyên biçûk bibirin, da ku em qurmê darê û pelên wê saz bikin.



2. Di gava duyem de, em ê ji pela pembehî parçeyên biçûk bibirin, da ku em çarçoveya tabloya xwe saz bikin.



## RAHÊNAN:

- **Destnîgara/ê behremend, teşeyeke ku tu jê hez dikî, hilbijêre û bi hunera fûseyfûsayê ango bi birîna pelikên rengîn bi awayê sêgoşe yan çargoşeyên biçûk li ser lênûsa wênesaziyê, saz bike.**

WANE 3

## GULDANKEKE JI KARTONÊ

Karton ji bo gelek tiştan bi kêr tê û cihê xwe di nav karê hunerî de jî digire. Carinan li ser tê nîgarkirin, carinan jî ji bo xemilandinê tê bikaranîn.



**Amûrên Pêwîst:** peleke şîn, karton, cawbir, silovan, morîk, pelik û şîrêz.



**Gavên Çêkirina Guldankê:**

1. Em ê jora kartonê heta nîvê wê mîna teşeya milkêşan bibirin.




2. Em ê kartonê li hev bizîvirînin û bi şîrêzê bi hev ve bikin.



3. Em ê pelika şîn, bi alîkariya şîrêzê bi binê kartonê ve bikin.



4. Em ê wan milkêşan bizîvirînin aliyê derve û bi şîrêzê bighînin nîvê pelika şîn.



5. Em ê silovanê li dora guldankê bizîvirînin û bi rêya şîrêzê em ê wê bi kartonê ve bikin.



6. Ji bo xemilandinê êm ê gulekê ji silovanê saz bikin û wê jî bi kartonê ve bikin.



7. Bi vî awayî guldanka me amade dibe.



## RAHÊNAN:

- **Wênesazê/a jîr, li gorî gavên li jor, guldankekê bi rengên ku tu ji wan hez dikî, saz bike û bixemilîne.**

**WANE 4**

## GULÊN JI KARTONA HÊKAN

Em dikarin sûdê ji her tiştên li derdora xwe bigirin û teşeyên nû ji wan biafrînin. Di vê waneyê de, em ê fêrî çawaniya çêkirina gulan ji kartona hêkan dibin.



**Amûrên Pêwîst:** kartona hêkan, peleke kesk, rengên avî, firçe, cawbir û morîkên xemilandinê, parçeyek têl û demançeya bilastîkê ji bo helandina şîrêzê. **Têbînî**: Eger demançeya bilastîk peyda nebe, xwendekar dikare çeqmeqê ji bo helandina şîrêzê bi kar bîne.



**Gavên Çêkirina Gulan:**

1. Em ê derdora kartonê bibirin, da ku em teşeyê giroverê bi dest bixin.




2. Em ê wan giroveran ji her çar hêlan bibirin, da ku em pelên gulê bi dest bixin.



3. Di encamê de ev gul tên bidestxistin.



4. Em ê wan gulan bi rengên avî (rengê sor) rengîn bikin.



5. Piştî rengînkirinê ev teşe tên bidestxistin.



**6.** Em ê her du gulan têxin hundirê hev û ji bo xemilandinê, morîkan li wan zêde bikin.




**7.** Ji bo em şaxê gulê saz bikin em ê têlê bi rengê kesk binûximînin.



8. Piştî wê, em ê ji pela kesk, pelên gulê bibirin.



9. Em ê wan pelan bi alîkariya şîrêzê bi şaxan ve bikin.



**10.** Bi vî awayî gulên me bi dawî dibin û bi vê teşeya xweşik derdikevin.



## RAHÊNAN:

- **Nîgarkêşa/ê pêşerojê, li gorî van gavên ku di vê waneyê de bi me re borîne, hin gulan ji kartona hêkan saz bike. Bi wan odeya xwe bixemilîne yan jî diyarî heval û mamosteyên xwe bike.**

**WANE 5**

# RÊBAZA KELEMKELEMÎ

Rêbaza kelemkelemî, ew jî rêbazeke hunerî ye û gelek teşe pê tên çêkirin. Em ê di vê waneyê de fêrî çêkirina hin teşeyan bibin.



**Amûrên pêwîst:** peleke kesk, peleke zer, pênûsa risas cawbir û şîrêz.




## Gavên Çêkirina Karê bi Rêbaza Kelemkelemî:

1. Em ê teşeya keçekê xêz bikin û bibirin.




2. Em ê mirûzê wê nîgar bikin.



3. Em ê cilên wê ji rengê kesk saz bikin.



4. Ji rengê zer, em ê hin milkêşan bibirin.



5. Di dawiyê de, em ê wan milkêşan bi awayekî kelemkelemî bitewînin û bi serê keçikê ve bikin, da ku jê re bibe por. Bi vê yekê tabloya me diqede.



## RAHÊNAN:

**Wênesazê/a zîrek, teşeyekê hilbijêre ku tu rêbaza kelemkelemiyê tê de bi kar bînî.**

**WANE 6**

## DAPÎR Û BAPÎR

Ji ber ku rêzgirtin ji reftarên herî baş e, em rêzgirtinê ji her kesî re digirin û bi taybet ji kesên temenmezin re. Di vê waneyê de, em ê wêneyê dapîrekê û bapîrekî saz bikin û hezkirina xwe di rêya wênesaziyê re, derbirînin.




**Amûrên Pêwîst:** pelên spî, pembehî, sor, şîn û zer, pênûseke reş, pênûsa risas, şîrêz û cawbir.



**Gavên Çêkirina Bapîr û Dapîrê:**


1. Em ê cilên wan ji pela zer û pembehî çêkin. Her wiha pela sor bibirin û paşê bitewînin.




2. Em ê bişkokan bi pênûsa risas xêz bikin.




3. Em ê du giroveran ji pela zer bibirin, da ku em serê wan jê saz bikin.



4. Em ê mirûzên wan xêz bikin.



5. Di dawiyê de, em ê çend giroverên biçûk ji pela spî bibirin û bitewînin, ji bo ku em porê wan saz bikin. Bi vî awayî tabloya me amade dibe.




## RAHÊNAN:


**Nîgarkêşê/a behremend, hewl bide ku tu di rêya pelên rengîn re, tabloyekê nêzî vê tabloyê saz bikî.**

WANE 7

## NÎGARKIRIN Û TEWANDINA PELAN

Nîgarkirin û tewandina pelan, yek ji hunerên Japonyayî ye. Em ê di vê waneyê de fêrî çêkirina wê bibin û weke lîstokekê bi kar bînin.






**Amûrên Pêwîst:** peleke spî, pênûsên rengîn, pênûsa risas û jêbir.




## Gavên Çêkirina Çêçikekê bi Rêbaza Tewandina Pelan:


1. Em ê pelê, weke ku di wêneyê jêr de xuya dibe, bitewînin.




2. Piştî ku me pelik tewand, em ê teşeyeke hêkî li ser nîgar bikin.



3. Em ê çêçikekê di hundirê pelê de xêz bikin.




4. Bi vekirina pelê re, çêçik di hundirê hêkê de xuya dibe.




5. Em ê mirûzên çêçikê xêz bikin.



6. Em ê dîsa pelê bigirin, da ku em hêkê reng bikin.



7. Di dawiyê de, em ê çêçikê jî rengîn bikin. Bi vê yekê em ê lîstokeke xweşik bi dest bixin.



## RAHÊNAN:

**Nîgarkêşa/ê jîr, hewl bide ku tu teşeyekê biafirînî û vê rêbazê, tê de bi kar bînî.**

WANE 8

## KAREKÎ JI DARIKÊN GUHAN

Darikên guhan, ne tenê ji bo paqijkirina guhan tên bikaranîn, lê belê em dikarin di aliyê hunerî de jî bi kar bînin û gelek teşyan jê biafirînin.



**Amûrên Pêwîst:** peleke spî, pênûsa risas, şîrêz, darikên cilan, cawbir û darikên guhan.



## Gavên Çêkirina Karekî ji Darkên Guhan:

1. Em ê darikên guhan bibirin.



2. Piştre, em ê du teşeyên hêkî bibirin; yekî mezin ji bo gewdeyê berxikê û yekî jê biçûktir ji bo serê wê.



**3.** Piştî wê, em ê wan darikan bi teşeya hêkî ya mezin ve bikin, da ku gewdeyê berxikê saz bibe.



**4.** Piştî ku em hemû darikan bi gewde ve bikin, em vê teşeyê bi dest dixin.



**5.** Ji bo ku em serê berxikê jî saz bikin, weke ku di vê wêneyê kêlekê de xuya dibe, bi heman awayî em ê darikan pê ve bikin.



**6.** Em ê mirûzê berxikê jî xêz bikin.



**7.** Em ê serî bi gewde ve bikin û darikên cilan jî weke ling bi kar bînin.



8. Bi vî awayî em vê teşeya xweşik a berxikê bi dest dixin.



## RAHÊNAN:

**Wênesazê/a jêhatî, li gorî gavên ku di vê waneyê de em fêr bûn, berxikekê bi darikên guhan, saz bike.**

**WANE 9**

## ÇAPER

Çaper, ew rêbazek e ku em dikarin di rêya wê re gelek teşe û nîgaran bi dest bixin. Gelek tişt hene em dikarin wan weke çaperê bi kar bînin.

**Mînak:** tiliyên dest, dembolên bilastîk, betat û hwd.






**Amûrên Pêwîst:** peleke spî, rengên avî, firçe û dembolekî vala.




## Gavên Çêkirina Çaperê:


1. Em ê rengê zer ê avî amade bikin û binê dembolê bixin di nav de.




2. Em ê binê dembol deynin ser pelika spî.



3. Teşeya pelên gulan bi vî awayî saz dibin.



4. Bi rengê avî yê kesk em ê pelên gulê nîgar bikin.



**5.** Her wiha em ê nîvê gulê jî nîgar bikin.



**6.** Bi vî awayî, me guleke pir xweşik nîgar kir.



## RAHÊNAN:


**Wênesaza/ê behremend, li gorî van gavên li jor teşeyekê bi alîkariya çaperê (çi tiliyên dest, dembolên vala yan jî amûrine din bin) xêz bike. Her wiha paqijiya tabloya xwe ji bîr neke.**

**WANE 10**

## MIJAREKE SERBEST

Karê destan aşopa me fireh dike ku em dikarin tiştên nû biafirînin û bi wan, ode û dibistana xwe bixemilînin.















## RAHÊNAN:

**Wênesazê/a pêşerojê, piştî ku te di vê beşê de nêrînek li ser karê destan stand, hewl bide tu mijarekê ji mijarên ku te jê hez kiriye hilbijêrî û saz bikî.**

## Belavkirina Waneyan Li Ser Sala Xwendinê

| Heftî / Heyv | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | Rengên Sar û yên Germ | Rengên Darî û yên Avî |
| Cotmeh | Rengên Avî | Rengên Avî | Nexş | Tawis |
| Mijdar | Tawis | Gemiya Hêlekanî | Papa Niwêl | Papa Niwêl |
| Berfanbar | Nîgarkiria bi Riya Teşeyên Dest | Seyrana Dibistanê | Paqijiya Jîngehê | Paqijiya Jîngehê |
| Rêbendan | Lêveger | Lêveger | Bêhinvedan | Bêhinvedan |
| Reşemeh | Karek ji Pelên Daran | Fûseyfûsa | Fûseyfûsa | Guldankeke ji kartonê |
| Avdar | Gulên ji Kartona Hêkan | Gulên ji Kartona Hêkan | Rêbaza Kelemkelemî | Dapîr û Babîr |
| Cotan | Nîgarkirin û Tewandina Pelan | Karek ji Darikên Guhan | Çaper | Mijareke Serbest |
| Gulan | Lêveger | Lêveger | | |